

Di Kilamên Evdalê Zeynikê de “hezkirina jîyanê û daxwaza mirinê”

Joy of Life and Death Wish in Evdal Zeynike’s Songs

*Hasan Karacan¹, Rasim Başar²***Abstract**

The most famous folk singer (dengbej) that is known as the first in Kurdish culture is Evdale Zeynike. He generally thematizes life, death, birds, nature, girls, boys and love subjects in his ballads. In his life nature, dreaming, Serhad (Eastern Turkey), Surmeli Mehmed Pasha (Smutty Admiral Mehmed) and Temo have important roles. Meeting with Surmeli Mehmed Pasha and his death have impressed the life of the master. Crane is an important type in his life. This type symbolizes subjects such as poverty, neediness, friendship and nature. The metaphor of “life and death” shows itself explicitly in his life and ballads.

Keywords: Life, death, Evdale Zeynike, poverty, Surmeli Mehmed Pasha

Özet

Kürtlerin dengbejlik kültüründe bilinen ilk dengbej Evdalê Zeynikê’dir. Çoğunlukla kıamlarında (şarkı, gazel) canlıları, ölümü, kuşları, doğayı, genç kızlar ile genç erkekleri ve aşkı konu edindir. Onun hayatında doğa, rüya görme, Serhad, Sürmeli Mehmed Paşa, turna ve Temo öğeleri önemli yer tutmaktadır. Özellikle Sürmeli Mehmed Paşa ile tanışması ve Sürmeli Mehmed Paşa’nın ölümü Evdalê Zeynikê’nin hayatında büyük bir etki ve iz bırakmıştır. Turna, Evdalê Zeynikê’nin hayatında önemli bir semboldür. Bu sembol fakirlik, yoksulluk, dostluk ve doğa gibi kavramlara karşılık gelmektedir. Onun hayatında ve kıamlarında “yaşam ve ölüm” zıtlığı kendini açık bir şekilde göstermektedir.

Anahtar Sözcükler: Yaşam, ölüm, Evdale Zeynike, fakirlik, Sürmeli Mehmed Paşa.

Recommended citation:

Karacan, H. & Basar, R. (2015). Di Kilamên Evdalê Zeynikê de “hezkirina jîyanê û daxwaza mirinê” [Joy of Life and Death Wish in Evdal Zeynike’s Songs]. *International Journal of Kurdish Studies* 1 (2), pp.43 – 56.

¹ Corresponding Author: Asst. Prof. Dr. Kurdish Department, Dicle University, Diyarbakir, Turkey.

E-mail: hasan.karacan@dicle.edu.tr

² MA student, Institute of Social Sciences, Department of Kurdish Language and Culture, Dicle University, Diyarbakir, Turkey. E-mail: r.basarr@gmail.com

DESTPÊK

Di dîrokamirovahiyêde bêşik a ku mirov û zindiyên din ji hev vediqetîne ziman û çanda wan e. Di dîrokaşaristaniyekê de, ji bo nîşaneyê peşketina çandekêpîvana yekemîn peşketina ziman e. Gelên ku li zimanê xwe xwedî derketine her tim zêdetir bi pêş ketine. Bêziman mirov bihev re nikarin bijîn û bi hev re nikarin têkiliyekê deynin û nikarin baş hevûdu nas bikin. Eger mirov biçavekî civaknasî li civakekê binêre mirov wê gavêdibîne ku ji bo netewekî şerta yekemîn ziman e. Ziman di navbera duh û îro de, di navbera nîfşên kevn û nû de pireke bêhempa ye. Ev pir e li gor peşketina ziman li ser lingan dimîne.

"Dîroka wêjeya devkî, ji wêjeya nivîskî pir kevintir e. Dema ku li dîroka wêjeya gelan dinihêrin em dibînin ku berhemên herî kevn yên wêjeyê herhebên devkî ne. Her çiqas ku hin ji van berheman hatibin jibîrkin jî berhemên ku li xweşiya civakê çûne, tevî hin guherînan, gihastîne heta roja îro" (Yê ji Ayyıldız û Birgören veguhêztiye Çiftçi, 2015). Di dîroka kurdan da çanda dengbejiyê li ser xîmên wêjeya devkî ye.. Çanda dengbejiyê; ji bo dîrokê, wêjeyê, erdnîgariyê, civaknasîyê, kevneşopiyê, derûnnasîyê û mûzîkê xîmeke pîrçewî ye. Bi saya dengbêjan, çanda kurdan gihiştîye hetenê nîfşên îro.

Peyva "dengbêj" peyveke hevedudanîye. Ji peyva " deng" û "bêj" pêkhatiye. Ji bo kilambêj û stranbêjan re bûye navekî taybet.

Dengbêjî di warê edebiyata devkîde kareke pîroz e. Ji bo edebiyata devkî Celîlê Celîl wiha dibêje: *"Edebiyata devkî şêwe û awayê 'vegotina çandî' yê xelkê ye. Ji ber vê yekê ye ku li Kurdistanê, dengbejî û çîrokbêjî pir pêşketî ye û li her derê, dengbêj û çîrokbêj hene. Ev dengbêjên ku piraniya wan xwendin û nivîsînê nizanin, gung bi gund, cih bi cih digerin û rojên rabirdû werdigirin û tînin roja me. Di eynî wextê de, bi gotinên xwe yên bijarte û awaz û awayên xwe yên taybetî, ew şahidî li dinya dihu, li dinya ku êdî winda dibe, dikin"* (Celîl, 1978:39).

Gava mirov dibêje dengbêj, bêşik ê yekemîn tê hişê mirov ku ew Evdalê Zeynikê ye. Evdalê Zeynikê, hunermendê bi nav û deng ê wêjeya devkî yê Kurd û Kurdistanê û dengbêjê dîwana Surmeli Mehmet Paşa bû. Di serê sedsala 19mîn de jidayik bûye. Li gorî lêkolînan Evdalê Zeynikê destpêka salê 1800î heta dawîya wê sedsalê jiyaye. Di derheqê ji dayîk bûn û mirina wî de neviyê Evdal, Emerê Zeynikê li gor pirtûka Ahmet ARAS wiha dibêje: *"Kalkê min li Cemalvêrdî hatiye dinê (gundê Seregola). Wexta ku wefat kir, kalkê min sed û deh salî bû. Min kalkê xwe dît û kilam û meqamên xwe ji wî hildan, kalkê min sal û sal û nîvekî berya şer wefat kir (Şerê Dunyayê yê 1'ê). Ez wê çaxê dozde-sêzde salî bûm"* (Aras, 2014:152).

Evdal, di nêzî 30 saliya xwe de xewnekê dibîne û piştî vê xewnê dengê wî zelal dibe û ji aliyê Xwedê ve îlham jê re tê. Bê navber bi rojandistre. Li ser zindiyan û miriyan, teyr û qulingan, dar û beran, xort û keçan, dilketî û evîndaran, mêr û mêrxasiyan kilaman dibêje.

Li gorpirtûka Ahmet ARAS neviyê Evdal, Emerê Zeynikê di derhaqê destpêkirina dengbêjiya Evdal dewiha gotiye: *" Kalkê min di serî da dengbêj nebûye. Hetanî ku salên wê dema emrê xwe jî ewî, mînanî herkesî bi rençberiya xwe û bi cot û cobarê xwe re mijûl bûye. Di wê dema emrê xwe da kalkê min şevêkî xewnekî dibîne. Di xewnê da vedireşe, garisên hûr ji qirika wî tîn xarê. Rîspîkî gund hebûye, mêrik him rîspî, him jî alim bûye. Sibetirê kalkê min diçe cem wî, xewna xwe jê re ibêje. Rîspî xewna wî waha şîrove dike; dibê: "Xudê xewna te bi*

xêr bike kurê min. Heke te ew xewna di 15 saliya xwe da bidîta, tê bibûya alimekî mezin, heke te di 20 saliya xwe da bidîta, tê bibûyayî merivekî pir dewlemend, lê te ku ew xewna di vê çaxa emrê xwe da ditîye, ez bawer dikim tê bibî dengbêjekî pir mezin ku heta dinyaya ava be, nav û dengê te wê bê gotin.” (Aras, 2014:152)

Ji vê bendajor tê fêhm kirin ku Evdal piştê wê xewnê dest bi dengbêjiyê kiriye. Lê belê piştê Evdal li Serhedê gelek dengbêj li ser şopa wî meşiyane. Bi têkildariya hoste – şagirt xwe perwerde kirine û tradisyonek ava kirine.

“Evdalê Zeynikê ruhê kilama Serhedê ye... Zimanê kilaman mîna avên kanyê çiyayên Serhedê zelal, paqij û xwezayîne, ewaz û qeydê wan xule-xul û leme-leme avên çiyayên Serhedê tînin bîra mêriv, mina pelên kulîlkan peyv û ewazên kilaman nazik, bînweş û rengîn, mîna hingivê ji kulîlkên çiyayên Serhedê şîrin û temxweşin....” (Boyîk, 2005)

Di derheqê dengbêjiyê de Dengbêj Xalê Seyîdxan wîha dibêje: *“Bila van kilaman ji me bigirin. Çewa ku me ji Evdalê Zeynikê hilgirtîye, bila ew jî ji me bigirin.”* (Boğaziçi Üniversitesi Edebiyat Kulübü Dergisi, 2008:38)

Jiyana Evdal, bi nasîna Surmeli Mehmet Paşa re dibe jiyana ka taybet. Piştî mirina Surmeli Mehmet Paşa Evdal diguhere û ji dinyayê sar dibe. Ev bûyer jiyana wî vajî dike. Mirov li gorvê, jiyana Evdal dikare bike du beşan:

1-Dema hezkirinajîyanê

2-Dema daxwaza mirinê.

“Jîn ûmirin” dû peyvên li gorî wateyên xwe dijberê hevî. Çawa ku tê zanîn her tişt bi dijberê xwe qewî ye. Vê dijberiyê xwe di nava jiyana Evdalê Zeynikê de jîgelekî daye nîşandan.

Ji lêkolînan jî tê fêhm kirin temenê Evdal ji sed salî zêdetir e. Li gundê Topraxqeleya girêdayê Eleşgîrê Dengbêjê Zor Surmeli Memed Paşa bû. Ew ne ku tenê dengbêjekî bi nav û deng bû. Ew aşiq, helbestvan û şexsiyetekî dema xwe yêmezî bû. Ev hûnermendîya wî carna ji girêdayîya wî ya jîyanê, carna jî derdê xizaniyê û kalitîyê dihat.

1-Homerosê Kurdan “Evdal”

Mehmed UZUN di romana xwe ya bi navê “Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê” de bi qehramanê romana xwe yê ku navê wî “Evdalê Zeynikê” bû, wiha dide axaftin “Şagirtino, dilgeşino... hûn dengê xelkê ne. Hûn bendewarê ruhê wî, qasidê hîs û canê wî ne. Bilivînine, bilezînine, mîna min, gotina dihu û pêr werbigirine, gotina xwe lê zêde bikine, li gora xwe biguherînine û bi pêşerojê biguhezînine. Hûn bi xwe biafirînine, siûda merivan û halê bûyeran bikine kilam û stranine. Bila kêmaniye hunermendiyê tê nîn be û ew lihevhatî bine. Li xelkê guhdarî bikine, pê alaqedar bine, bala xwe bidîne û wan seh bikine, bi gotina xwe, bi rabûn û rûniştina xwe nerm bibine. Xêr, feyde û siûda welat, xelk û zimanê xwe li ser her tiştî re bigirine...” (Uzun, 2010:32)

Nivîskar Aris Arda di sala 2007an de, Yaşar KEMAL û berhemên wî dinirxîne û tespîtekê dike. Ji bo şibandina şêweza Yaşar KEMAL – Evdalê ZEYNIKÊ wiha dibêje : “Di

eslê xwe de romanên Yaşar KEMAL ên bi tirkî hatine nivisandin mînanî ku mirov bi awayekî bi Evdalê Zeynikê kilaman tirkî bide gotin." Ev jî nişan dide ku şêwazên her du hosteyan ji heman binyadê tên. Her du jî ji heman kaniyê avê vedixwin.

"Mehmed UZUN bi tarîxa 1998 de di berhema bi navê "Dengbejlerim" de bi çend çawan Yaşar Kemal gotiye ku Evdalê Zeynikê Homerosê kurdan e"(Temo, 2005). Homeros çawa ku tê zanîn li ser 'Edebiyeta Yewnan a Dema Qilasîk' bandoreke mezin kiriye. Li gor çavkaniyan, Homeros nivîskarê Destana Îlyeda û Odysseîayê ye. Di wê demê de gelev destan ji ber zanibûn. Homeros li ser nivîskar û helbestvanên navdar 'Shakespeare, Virgil, James Joyce hwd.' bandoreke mezin kiriye.

Çawa destanên Homeros ji aliyên gel ve hatine ji ber kirin, îro kilamên Evdal jî ji aliyê gelê kurd ve hatiye ji ber kirin. Çawa ku Homeros li nivîskar û helbestvanê navdar bandor kiriye, Evdal jî li ser helbestvan û nivîskarên navdar ên mînanî; Yaşar KEMAL, Mehmed UZUN, Şakiro, Şeroyê Biro, Reso bandor kiriye.

2. Di Jiyana Evdal De "Hezkirina Jîyanê"

2.1 Dema Xortaniyê

Ji bo danasîna peyva "jîyan" ê gelek tişt hatine gotin û hê jî tîst gotin. Li ser wateya jînê ol (bawerîyan), zanist û felsefeyan gelek tiştên cur bi cur gotine û wateyên nû li vê peyvê bar kirine. Jiyan bi hatina dinyayê dest pê dibe û bi mirinê jî bidawî dibe.

Heyama ewila Evdalê Zeynikê ya evîndariya jîyanê ye. Bi gotina wî, ev heyama xweş ji 13-14 saliya wî dest pê dibe (bi qewlê dengbêjan; di kemla xortaniyê de) bi mirina Surmeli Mehmed paşa (1865) bidawî dibe. Di kilamên wî yê di vê demê de evîn, hêvî, xweşbînî, xwebawerî, serfirazî, coş û kelecaneke xwiya dibe. Ji xwe ew hunermendekî bi serê xwe û bi dilê xwe bû. Evdal gava diçe cem Surmeli Memed Paşa, tirsê wî ya mezin ketina bin nîr e; lewma di serî de jê re dibêje:

"- Paşa xweşbe, ez merivekî serbixwe û destûrdayî me, dengbêjiya te ji min re zehmet e, tu were ez nikaribim ji binê barê te derkevim.

Li ser vê gotinê Evdal, paşa têdigihîje ku dengbêjiya dîwana wî ne bi dilê wî ye, weha lê vedigerîne:

-Tu ku bibî dengbêjê min, bi we'da Xwudê be, ez tîkilî te û karê te nabim, tuyê li cem min dîsa destûrdayî bî, dilê te çawa dixwaze wisa bike." (Aras, 2014:49)

Evdalê Zeynikê, di zaroktiya xwe de heyranê xweza û jîyanê bû. Bi tena serê xwe diçû deşt û zozanan, nav beççe û ber çeman. Guh dida dengê avê û çivîkan. "Evdalê Zeynikê tîkilîyeke xurt bi jîyanê re daniya. Jiyan pir kûr hîs dibe. Car çawan derdikeve çolê. Bi zinaran re bi kûlîlkan re sohbetê dibe. Dêdê dilê xwe dide wan, êşa xwe dide wan. Car çawan tê nav jîyanê bi gundiyê xwe re bi cînarê xwe re der haqê felsefa jîyanê de diaxive. Taybeytiye wî ev bû ku ji deşt û zozanan gelekî hez dikir, ji mirovan, ji heywanan hez dikir. Evdal evîne jîyanê

bû" (Evdalê Zeynikê, 2010). Di xortaniya xwe de gelekî bêdeng û hestiyarbibû. Her tim guhê xwe dide xwezayê.

Gava Evdal xewn dibîne û dibe dengbêjekî bi nav û deng, têkiliya wî û jîyanê qewîtir û geştir dibe. Evdal gelekî beşdarê dawetan, mihricanan, şahiyên dibe. Li heremêgel gazî wî dikin, dixwazin ku Evdal beşdarê daweta wan bibe û wan şad bike. Dema xortaniya xwe de û berî mirina Surmeli Mehmet Paşa de kilamên ku striye piraniya wana li ser evînê, av û çeman, teyr ûqulingan, mêrxasî û xweşîyên jîyanên bûne. Evdal di wê demê de kuçend kilamin ku striye evin: Ezê Ji Erzurûmê Hatim Bi Kawranî, Dîlber, Şêx Ronî, Hayê Li Min, Leca Evdal û Gûlê, Lo Mîro, Lê Axçik Canê, Sîncarî Talo, Ezê Ji Teyra Teyrekî Hur im, Evdal û Şêx Silê, Dêrsim e Xweş Dêrsim e.

"Evdal, tevî gundiyan bi kerwanî dîçe kêşa Diyarbekirê. Di wê rêwîtiyê de rastî qîz û bûkên bedew tê, ji wan re kilaman dibêje. Li Zozanê Silê qîzekê bedew dibîne û kilameke davêje ser wê:

Hayê Li Min

Hayê li min, hayê dilo...

Minê li dîharê Zozanê Silê

Şalûr hat bû mêvanê gulê

Ji sibê hetanî êvarê tew-tew fikir,

Bi dozde awaza digo, lebê-belê

Awirê çavê vê teresê teres-bavê

Fenanî topek ji topê Kurd Elo paşa

Meriv dayne Çiyayê Qerejdaxê

Bigrê bavê Birca vê Musilê

Xudê meriva neke tora te sêrbazê, te gawurê

Mîna bi gulla topê birîndar be

Ji sibê heya êvarê ji ber birîna xwe bidilê...

Heyla hayê li min, hayê dilo

Heyla hayê li min, hayê weylo"

..... (Aras, 2014:40)

Di vê kilama jor de peyvên "Zozanê Silê, şalûr, tew-tew kirina çivîkan, awirê çavan, Çiyayê Qerejdaxê" eleqedariya Evdal û jîyanê bihevne nişan dide. Hinek ji van peyvên qala xwezayê dikin. Bidelaliya xwezayê dilên mirovan bi dinyayê xweş dike. Ew peyvên din jî qala evîniyan dikin. Eger ku di dilê mirov de evîn hebe destên mirov tu car jî dinyayênabe. Daxwaze dilê mirov her tim dibe dîtina evîndarê mirov.

Evdal, gava bi Surmelfî Mehmet Paşa re ji bo Şerê Xozanê di Dersimê de diboriya kilama xwe ya bi navê "Dêrsim e Xweş Dêrsim e" distirî. Di vê kilamê de qala delalîya qizên heremê û pesndayîna ardnîgariya Dêrsimê dike.

Dilêm lo lo, dilêm lo lo, dilêm lo lo
Dilêm lo lo, dilêm yar yar
Dilêm lo lo, Dêrsim e loxweş Dêrsim e
Avên çeman û kaniyan tîn ser me da gime-gim û zime-zim e
Ezê li Dersima Jêrîn rastî sê zerya hatime
Yeka Tirk e, yeka Kurmanc e, yeka Ecem e
Bextê we da me birano, wana bi avirê çava ez kuştîme...
Dilêm lo lo, dilêm lo lo
Dilêm lo lo, dilêm yar yar
 (Aras, 2014: 81).

Di kilama jor de Evdal bi dilê xweredipeyive. Kilam bi 'dilêm lo lo' destpê dike. Qala xweşiya gime-gim û zime-zima av, çem û kaniyên Dêrsimê dike. Qala qizan dike û wana li gor perî û perîzade teswîr dike. Ev teswîr jî şanîdana hezkirina wî ya jîyanê û delîlên qewîbûne hûnermendiya wî ne.

Evdal di dema xwe de li herema dor xwe dengdaye. Di kilamên xwe de vê deng dayîna xwe wiha tîne zimên;

Qonaxa Bavê Te Kulî Ye
Evdal digo Temo lawo îro qonaxa bavê te Kulî ye
Komek qîz û bûkê kulyê li ser ava Erez kiras-şo daniye
Qîzekî digo hela mêzekin, ew kalê şerpezêli ser piştî hespê kî ye?
Malxirabo ku dike qîrîn, meriv dibê qey dîn e, yan cinnûye (bi cina ketiye)
Xwenga wê ya mezin digo hêdî qiseke, bira dengê te neçê wî ye
Korê, çima tu nizanî, ew Evdalê Zeynikê, bavê Temo, siyarê Kûvî ye
Ew îro li Soylemeza Jorîndengbêjê deweta Qulî ye (Aras, 2014:130)

Ji kilamajor tê fêhm kirin ku Evdal, li herema xwe bûye dengbêjekî navdar. Ji axaftina qîzan jî derdikeve holê ku li derûdorê xwe tê nasîn û hezkirin. Ji bo dawetan, ji bo şahiyên gazî wî dikin.

3. Daxwaza Mirinê (Piştî Mirina Surmeli Mehmed Paşa)

Ji bo mirinê gelek tişt tîn gotin. Li gorî gelek baweriyên olî gava rih ji laş bikişê û bigihêje afirînerê xwe, jê re mirin tê gotin. Danasîne mirinê ji bo zanista olî, pisîkolojiyê, tasavvufê, zanista gelê bu ye mijareke girîng. Bêşik mirin di nav çandan tevde ji bo yên dimînin xemgîniyekê giran çêdike.

Mirin ji bo her tiştî dawîbûne. Ev dawîbûn ji bo mirovan gelek caran tirs û gûmanan çêdike. Li gorî gelek baweriyên û felsefeyan mirin, ji bo zindiyangihîştina afirînerê xwe ye. Piştî mirina Surmeli Memed Paşa û bidawîbûna desthilatdariya malbata wî jî êdî Evdal bêxwedî maye. Di serî de ji bo debara malbata xwe di gundê Qanciya de digel dengbêjîyê, rênçberî û sewalvanîyê(heywanvanî)dike. Bi gotina kurê neviyê wî yê bi navê Beşer Berke, Evdal ji vî gundî jî mala xwebar dike diçe Dadewêrana Xînûsê; du salan jî li wir dimîne lê, "ji ehlê wê kêşê aciz dibe" careke din mala xwe tîne Qanciya.

Evdal di vê kilama jêrde yaku bi navê "Heyla Wayê" tê zanînde, qala çûyîna Şerê Xozanê dike û li ser mirina Surmeli Memed Paşa disekine.

Heyla Wayê

Temo lawo îro dilê min şewîtî, li halê mi girîya

Lo lawo hela bala xwe bidê ronî ji ber çavê min biriya

Wextê ku ez bi Surmeli Memed Paşa ra çûme Xozanê

Bila Rebbê Alemê emanete xwe ji min bista

Gava ku kokaegîtan û efrûta li me qeliya

Bavê te di dawîya emrê xwe da mîna peza gura-girtî

Ji refê xwe qetya û maye li dû birra û kerîya

.....

Bira qeda bê li herçar rojê vê dinyayê

Kes pê bawer nebe, emrê çûyî berxê êdî şûnda nayê

Ezê ricakî ji Rebbê Alemê bikim,

Belkî Xudê li ser îmanê emanetê xwe ji mi bistîne

..... (Aras, 2014:128)

Şerê Xozanê di jiyana Evdal de cihekê pir girîng girtiye. Evdal qala xwe û çûna Şerê Xozanê dike. Bûyera ku hatiye serê Surmeli Mehmed Paşa û ku bûye sedemê mirina wî, Evdal gelekî xemgîn kiriye. Evdal bi mirina Surmeli Mehmed Paşa dibêje ku koka egîtan li dinyayê qeliyaye. Xwe dişibîne pezê ku ji kerîya xwe qetiyayî. Ji Xwedê daxwaza mirina xwe dike ku ji vê xemgîniyêxelas bibe.

Li gorî tespîta Ahmet ARAS: "Şairê Turkmenan yê bi nav û deng Dadaloglu jî wê demê li cem Axayê Xozanê bûye. Ango şairê Turkmena yê bi nav û deng Dadaloglu û

helbestvanê Kurd yê herî mein Evdalê Zeynikê hatine pêşberî hev, lê hayê wan ji hev nebûye. Dadaloglu ji bo wê bûyerê awha dibêje:"(Aras, 2014:85)

"Dadaloğlu yarın kavga kurulur

Öter tüfek davulbazlara vurulur

Nice koç yiğitler yere serilir

Ölen ölür kalan sağlar bizimdir." (Boratav, 2000: 148; II numaralı şiir)

Kurdiya wî Ahmet ARAS wiha wergerandiye;

"Ew rojê dîsa bê, dîsa şerê tevkeve

Tiving wê deng bidin, dawlumbaz wê lêkeve

Sultan xweyî ferman be, çiya û banyê me hene

Ki dimre, bira bimre, saxên me besî me ne." (Aras, 2014:85)

3.1 Dema Kalîtiyê

Evdal hingê ji kalîtiyê gazincan dike, mirineke zû dixwaze. Evdal rojekê li hespa xwe siwar dibe ku here mala Qulixan Begê, di rê de li gundê Kulyê li ser çem rastî qîz û bûkên wan tê. Ew bûk û qîzên wî gundî ji Evdal xeber didin. Evdal fêhm dike û kilamekê davêje ser wan. Di wê kilama xwe de gazinan ji kalîtiyê û ji xizaniyê dike. Ew kilam wiha ye;

Ji mirina Memed Paşa vir de ez şerpeze me

Wey kalîyê, wey koryê

Xudê xirab bike kalaniyê

Welle Temo lawo mirin çêtir e ji feqîriyê

Heyla lawo, vê felekê nizam çima li bavê te ha kir

Berxê min lawo, emrê bavê te nêzîkî heştê sal kir

Bavê te li Xozanê yekî mîna Memed Paşa wînda kir

Di dawiya emrê min de felekê barê feqîriyê li min bar kir

Wey kalîyê, wey koryê

Xudê xirab bike kalaniyê

Welle Temo lawo mirinçêtir e ji feqîriyê

..... (Aras, 1996:125)

Evdal di vê kilama jor de piştî mirina Mehmed Paşa û wirde astengiyên ku kişandiyagelekê wî êşandiyê û hete daye qirika wî. Ji vê sedemê gilî û gazinên xwe ji kalîfî û koreniyê dike, xelasiya xwe di mirinê de dibîne. Ev hevoka Evdal ku dibêje "mirin çêtir e ji feqîriyê" di nav çanda kurdan de bûye mîna gotineke pêşyan û dibe benîştê ser devê kal û pîr û xizanan. Qala temenê xwe jî dike ku li gor kilamê jêr, temenê wî bûyenêzîka heystê salî.

.....

*Temo lawo ezê bi dîharê pira Kulyê diketim bi dar û bî ye
Her dû aliyê Pîra Kulyê bi çiya û newal û gelî ye
Evdalê Zeynikê bavê Temo, gula govenda, siyarê Kûvî ye
Gundê ku ew lê bûye mêvan, gelek qîzê mîna te lava kiriye
Digom Evdal me ramûse, mi daxwaza wana paştta vegerandiye
Xwenga piçûk digo **ev kalê han** çima kilama davê ser min, dike qîrîn e
Lê lê xwengê tu dibê qey ev kalê han xurîfyê, yan jî dîn e
Ebûr nabe Temo lawo ebûr nabe*

*Evdal digo qîzê te çima awha di ser mi da zarke- zark e
Çend sal berê xelkê digo Evdalê Zeynikê çi xortekî başî pak e
Çima ku çend diranê min ketine, çend tayî spî li rûyê mi hatine
Loma ew keçîka pîsa-pintî awha dibêje, poz bi mi nake,
Ebûr nabe Temo lawo ebûr nabe*

Ji destê qîz û bûkê vî zemanî

Rêwyê riya di riya xwede derbas nabe (Aras, 2014:132)

Di kilamê jor de qala kalîtiya xwe dike û qala xwe, ya berî çend salên ku pesnê wî didan dike. Ji sedema ku diranê wî ketine û çend tayên spî li ruyê wî peyda bûne qîzik pê poz nakin. Ji vê sedemê jî ji qîz û bûkên wê demê gazincan dike.

3.2 Evdal û Qulingê Baskîkestî

Hevaltiya Evdal û qulingê baskîkestî nîşan dide ku Evdal çikasî têkildarê xwezayê ye. Di koritîyaxwede, xwe û qûlingekî baskîkestî wek hev dibîne. Ev qulingê baskîkestîhetanî dawîya jîyana wî pê re hevaltiyê dike. Di koraniya wîde dilê wî bi qulingê baskîkestî dişewite. Wî tîne mala xwe û par û baskên wî yên şikestî girê dide. Wî xwedî dike pê sebra xwe tîne. Jina wî Eyşoji vê halê wî pir aciz dibe. Ji sibê heyânî êvarê ji xizani û belengaziyê giliyên xwe dike. Ji Evdalê kalê ketî jî gazinan û lomeyan dike. Tim û tim di ser de dilobîne û wî ji canê wî bêzar dike û gelekî wî diêşîne.

.....

Evdal quling hemêz dike, ji wê da tîne
Bi danê esrê ra xwe bi malê ra digihîne
Dema ku Eyşo quling li hemêza Evdal dibîne
Li nav çavê xwe dixê, dike qîrîn û qutîn e
Dibê ew çend kod zikataku xelkê ji zarokê min ra anîne
Evdalê here teyr û tûyê çolê bi xwe ra hilde bîne
Xwidê qebûl neke, wê teyr û cûcîkê xwe lê biçêrîne
Di nîvê zivistanê da wê qût û qismetê me biqedîne
Eyşoya hêsîr û belengaz wê paşê ji ku bîne (Aras, 1996:135)

Jiyana Evdal bi hevaltiya quling û wirve diguhere. Evdal rewşa xwe ûqulingê baskîkestî dişibîne hev. Çawa ku ew kal bûye, çavên wî kor bûne û piştî mirina Surmeli Mehmed Paşa kêmqedir bûye; quling jî ji sedema ku baskên wî şikestine nikare mîna refên xwe bifire ûtena bi serê xwe maye, ew qedera xwe û quling wek hev dibîne.

3.3 Koranî

Evdalê kal û korê ketî yê ku ji destên xizaniyê belengaz bûye û ji gilî û gazine Eyşoya kevaniya mala xwe ya zimandirêj tengazar bûye, tûrê xwe bi milê xwe ve dike, bi qewlê dengbêj û çîrokbêjan heta mirina Temo bi destê Temo digire. Piştî mirina wî, kurê xwe yê Mihê dide cem xwe; gund bi gund, qonax bi qonax li recûyê digere.

Recû ne pars e; di çanda Kurdan de kevneşopiyê civakîya piştevaniyê ye. Kesê ku bi ser de qeza û bela hatine, wek mînak agir bi mal û axûr û merka(kadîn) wî ketibe, bi zilm û zordariya neyaran ji gundê xwe reviyabe, an jî di can û bedena wî de nexweşiyê bêderman peydabûbe, li nav êl û eşîr û nas û dostan digere; ew bûyerên ku hatine serê wî bi awayekîrasteqîn vedibêje û pere, sewal, xurek û alîkarî berhev dike. Recûkar, wek parsekan ji xwe remîna pişe nahesbîne û heta dawîya dawîn berdeyam nake. Bi başbûna rewşa aboriyê re recûkar dev ji vî karî berdide.

Kalitî ne bes e, koraniya reş û tarî jî xwe dide ser çawên wî. Ev rewşa kambax dara pişta Evdalê Zeynikê ji binî ve dişikîne. Evdal ji bo vî halê xwe wiha distrî:

.....

Evdal koranî lê, lê, lê
Ax lê, lê, ne tu çek e,
Belkî rebê alemê, milê mêrikê misilman,
Cimaeta hazir, lê, lê têra neke.

Xelkê wunda kiriye
Mal temelê dinê û dinyalikê
ga, pez, û kotan, cot û çêlek e,
Evdalê lawê Zeynikê,
Piştî heftê heştê salî da,
Winda kiriye cotek çavê reş belek e,
Dilê yar yar, dilê yar yar. (Çamlıbel, 2005:130)

Bi qewlê wî êdî "aborî nabe". Birek zarokên hûr, Temoyê sêwî, qulingê baskşikestî, Eyşoya pitpitok û zimandirêj... Evdalê dilbikul û bêçare, piştî heftê- heştê saliya xwe wê bi ser rêya bikeve, gund bi gund, qonax bi qonaxbigere; ji bo recûyê wê xwe bavêje ocaxa axa û malmezinên kurdan.

.....
Xwedêyo, te çima li min wiha kir?
Gava emrê min sêzde çarde bû,
Te çima dilê min li dinya derewîn şad kir,
Te emrê min derbasî heftê kir,
Korbûn li min peyda kir,
Ez şîva şerpeze, li pey heval û hogira,
Li dinyayê stûxwar kir.
Aborî nabe, lawo ez nizanim wê îro pêve,
Axiriya însanê kal û kor wê çawa be?
Eman, eman, eman, eman,
Ax eman, eman, eman, way koraniyê.
Way koraniyê, way koraniyê,
Lawo mirin çêtir e
Ji halê vê feqîriyê.
Loo, looo mîrooo,
Rabe vê sêbêngê min dizanî,
Pêşiya bavê te her sê,
Lê, lêê mehê zivistan e,
Felek xayîn e, dinya ye,
Min ji te re nego, tu caran,
Tim cara çira kesî heta sibê naşixulîne,
De tu rabe destê bavê xwe bigire,

Ser axayên welatê Serhedê bigerîne (Çamlıbel, 2005:80)

Di jiyana Evdal de piştî korbûna wî mirin jê re bûyexilasiyek. Ji vê sedemê gelek caran di kilamê xwe de qala mirinê û daxwaza mirineke zû kiriye.

Mihê lawo kalanî koranî ne tu çek e

Xwedê milê mêrê camêr pêde neke

Mihê lawo xizanî ji mêrên camêr re milşikandin û şek e

Xaliqê alemê amanetê xwe ji bavê te bistîne,

Li dinyayê rezîl meke (Çamlıbel, 2005:130)

Piştî ku temenê Evdal ji sedî derbas dibe êdî nikare kilaman bibêje. Car carna eger yekê qedirşînas ji wî kilamek bixwesta, dilê wan nedihîşt disa ji wan re distirya.

Evdal nexweş dikeve, çendekî bi vî halê xwe yê nexweş di nav ciyande dimîne. Rojekê kurê wî Mihê dinêre ku nexweşiya bavê wî lê giran bûye. Rewşa wî rewşa mirinê ye. Mihê ji Evdal destûrê dixwaze ku here gazî melê gund bike lê belê bavê wî destûrê nadê. Ji zarokên xwere dibêje ez bêşûç û bêgunehim. Ezê rîsipî herim huzura xwedê.

Evdal ji zarokên xwe û neviyên xwere wesiya xwe dike. Ji wanre dibêje ku çend kilamên ku ji wanre hiştîyê ji xezinên dinyayê tev bi qedir û qiymetir e. Evdal bi taybetî jî kilama "Dersimê" û kilama "Xozanê" bi wan dide jiberkirin. Dixwaza ku her tim li van kilaman xwedî derkevin.

3.4 Tradîsyona Evdalê Zeynikê

"Ew dengbêjên me yên Serhedê yên îro gişk di terzê kalkê min da distirên. Şeroyê Biro, Reso, Şakiro û yên din wên ku di radyoya Rewanê da distirên. Şeroyê Biro ew hema mînanî kalkê min distirê" (Aras,2014:152). Ji aliyê zaniyaran ve tekildariya di navbera hoste û şagirtan wek "Tradîsyona Evdalê Zeynikê" hatiye pejirandin.

Tirsa Evdal yek jî ew e ku nifşên piştî wî werin vê hûnermendîya dengbêjiyê nikaribin pêk bînin û rabin navê dengbêjan li xwe bikin. Li ser vê mijarî jî vê kilama li jêr dibêje:

Heyla Wayê

Temo lawo, derdê min besî min nîne,

Nizanim îro te li min xêr e,

Lawo îro girrek bi lingê mi ketiye

Hetanî tepa serê mi dihêre,

Hey lo lawo mizgînîya min li te be,

Min berhemek usa li dinyayê hiştîye.

*Heta roja qiyametê li erdê bimîne,
 Ew tucar xirab nabe, mîna zêre...
 Lawo tirsar mi tune ji mirinê, ezê bimirim,
 piştî min ra tu were her kes rabe
 Dewa dengbêjiyê, şairiyê bike,
 Wê bêjin xelk li gotin û miqama napirse,
 Herkesê meydanê bide hespê xwe
 Ê li hesabê xwe binhêre... (Aras, 1996:145)*

ENCAM

Evdal di dema xortaniya xwe de berî ku hê nebûye dengbêj jî gelekî ji xwezayê hez dikir. Her tim têkiliya wî û xwezayê bi hev re hebû. Piştî ku xewn dibîne û dibe dengbêj, hestên hezkirinêyan ajalanû xwezayê zêdetir dibe. Bi dema naskirina Surmeli Memed Paşa û wir ve ji aliyê aboriyê ve jî rewşa wî geştir dibe. Ji van sedaman Evdal ew dem li gor dilê xwe jiyaye û bibû evîndarê jîyanê. Li gor hezkirina jîyanê jî bi piranî kilaman li ser evînê, li ser hezkirinê gotiye. Evdal, li gor hezkirina xwezayê û hûnera dengbêjiyê mirovekî gerdûnî bûye. Dengbêjiye Evdal, bi hûnerê xwezayî û bi zimanekê zelal bû.

Evdal ji sedema mirina Surmeli Memed Paşa, dilê wî ji dinyayê sar bibû. Piştî mirina Evdal, ji hêla aboriyê ve rewşa wî bi nebaşiyê ve çûye. Li ser van derdan de kalîti û koranî jî daye ser. Ew dem Evdal mirin ji xwe rewêkî xelasiyeke mezin dîtiye. Li gor kilamên wê demê bi piranî ji kalîtiyê û koranîyê gazincên xwe kiriye. Kalîti û koranî ji mirinê diwartir û xeternaktir dîtiye. Lewra kalîti, koranî û xizanîmêrê camêr di nav civatê de rezîl, bêqedr û bêrûmet dike. Ji van sedaman kilamên di vê demê de gotiya bi piranî li ser gilî û gazincên kalîti, koranî û dawxaza mirinê.

ÇAVKANÎ

Aras, A. (1996). *Şairê Kurda yê Efsanewî*. Stenbol: Weşanên Deng.

Aras, A.(2014). *Şairê Kurda yê Efsanewî; Evdalê Zeynikê*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê

Boğaziçi Üniversitesi Edebiyat Kulübü Dergisi. (2008, Hejmar: 9). Erişim Tarihi: 15 Temmuz 2015, <http://www.bued.boun.edu.tr.html.yazinca9>

Boratav, P.(2000). *İzahlı Halk Şiiri Antolojisi*. Boratav Arşivi'nden 1. İstanbul: Türkiye Ekonomik ve Toplumsal Tarih Vakfı.

Boyîk, E. (2005). "Bilbilê Welatê Serhedê: Evdalê Zeynikê"

Celîl, O. û Celîl, C. (1978). "*Zargotina Kurda*". Moskova: Weşanên Naûka.

Çamlıbel, E.C. (2005). *Evdalê Zeynikê Hîndarê Mekteba Stranên Serhedê*. Stenbol: Weşanên Deng

Çiftçi, T. (2015). *Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjîyê*. International Journal of Kurdish Studies, 1, 114

Gündüz, M. (2010). *Evdalê Zeynikê* [Belgesel]. Fransa

Temo, S. (2005). *Abdalın Bir Günü*. Stenbol: Weşanên Ithakî.

Uzun, M. (2010). *"Destpêka Edebiyata Kurdî"* (çape II.). Stenbol: Weşanên Ithakî.